Weki din ev kiryarên dema Behramê yekem wê bidom in heta dema behramê duyem û wê di wê demê de wê ev wê sasanî wê di awayekê de wê weke ku wê were dîtin wê bi temenî wê sasanî wê lawaz bikê. Di wê navberê de wê, imparatorê roma Carus wê bi seferên xwe yên li herêmê dikê wê gelek herêmên weke ermeniya roja me û heta azarbeycana roja me wê li ser wan wê serdestîya xwe wê denezênê. Di wê temenê de wê di wê demê de wê, were dîtin ku wê Behremê sêyem û Nerseh wê bixwezin ku ew cardin sasanî wê werênina ser sêra berê. Nerseh wê bi hêzên kurd ên herêmê re wê weke dema şapûr wê bixwezê ku ew têkiliyên xwe baş dênê û wê di wê temenê de wê, teminatên başkirinê wê bide wan. Di wê demê de wê li herêmê wê hinek mirgehên kurd wê li ser wê piştgiriyê wê bidina nerseh û wê li herêmê di seferên xwe yên li hemberî artişên imparatorê romî galerius (305-311) de wê, di awayekê de wê were dîtin ku ew gelek serkevtinan wê bidest bixê. Wê herêmên li keviya firatê û hwd ên li dora anatolia heta gelek herêmên nava wê paqij bikê. Bi wê rewşa serkevtinê wê seferê wê bixwezê li herêmên ermenya û deverên li dora wê bikê ku ew wan jî bidest bixê. Lê li gorî hinek riyawatna wê nerseh wê di wê sefera xwe de wê bikeve xafkê de û wê, di wê demê de wê, ku ew li anatolia roma ketinê ku ew destûrê bidina û bi ser wan de neçin wê ji sasanî wê li ser wê rewşa kirina xafkê a nerseh de wê,

bixwezin ku ew peymanê çêbikin. Di encama wê de wê, peyman wê were çêkirin û wê rewşan wê di wê temenê de wê li herêmê wê bibê. Di awayekê din de jî wê, weke pêwîstiya wê peymanê wê herêmên dorê ên weke ermanya û heta herêmê gûrçîstana roja me ku ew roma kirina dest êdî ew seferê li wan nekê.

Li gorî hinek ragihandinna wê, ew wê were herêkirin. Lê li gorî hinek rêwayatna wê ew wê, were ser ziman ku wê, di dema kûrê Nerseh hûrmûzê dêyem de wê, sefer wê li herêmê wê werina kirin û wê di awayekê de wê, roma wê li herêmê wê werina zayifkirin. Di wê demê de wê di seferê ji wan seferên xwe de wê bê ragihandin ku wê hûrmûzê duyem wê were kuştin. Û piştî wî kûrê wî Adûr nerseh wê wê were ser taxt. Ew jî wê di dewama bavê xwe de wê seferên wî bide domandin. Li gorî hinek ragihandinna wê ew wê di serên xwe de wê li hemberî roma wê li herêmê wê bi serkeve lê ji herêmên araban komên ku ew wê bi wan re wê bikeve şerê de. Ber ku wan talanên mazin dikirin. Weki din wê bê gotin ku ew jî wê di nava wan seferên li hemberî wan koman de wê jîyane xwe wê ji dest bide. Di wê demê de wê were gotin ku wê, piştî wê, ti kesekê ku ew herê ser taxt wê nemênê û wê, şapûrê duyem ku wê were bi navkirin ew hê ji zikê dayika xwe nehatiya dînyê wê were danîn li ser taxt û wê, weke şahê sasanî wê taç bê danîn li ser serê. Piştî ku ew bû wê di demek kin de wê weke şahekê xort wê xwe bide dîyarkirin. Gelek pêşketin wê di dema şapûrê duyem de wê weke ku wê were ser ziman wê bibin. Ew wê komên ku ew ji aliyê herêmên araban ve dihê wê seferê li wan bide kirin û wê bi serkeve. Wê piştî wê seferê li herêmên ku wê hêzên roma bidest xistina wê bikê û wê wan jî wê were gotin ku ew li hemberî roma wê serkeftinek mazin wê bi dest bixê. Şapûrê duyem wê bi hêzek mazin ku wê çêbikê ji herêmê bi levkirinên ku ew di nava xwe de dide çêkirin re wê herêmên di destê roma de wê cardin wê bi dest bixê û wê piştî wê bi imparatorê roma konstantinê duyem re wê peymana li hev nehêrîşkirinê wê bide çêkirin û ev peyman wê di awayekê de wê li gorî hinek rêwayatna wê pêşîya hêrîşên roma ên li herêmê wê bide girtin û wê, demekê wê herêm wê bi wê di aramiyê de wê derbas bibê. Di wê demê de wê di seferên ku wê bikê de şapûrê duyem wê, li pênc wilayatên mazin wê ji destê roma wê bigirê.

Li gorî ku wê were ser ziman wê di wê demê de wê, şapûrê duyem wê beşên wînda ên avêsta de jî wê bide dîtin û wê temem bikê. Wê di wê demê de wê politikayek olî a bi rêzkarî û ankû disiplinî wê bimeşênê. Bi zêdeyî wê bixwezê ku ew di mijare olî de ew yekkirinekê çêbikê û wê, di

wê temenê de wê komên din ên olî wê bê gotin wê bikevina bin pêvajoyek tafisandin û çewisendinê de.

Di aslê xwe de ev politikayên olî ên şapûrê duyem wê dikarê di bin bandûra du tégînên olî û pêvajoyên pêşketinê de wê bixwûnê. Di wê demê de wê maniyî wê di wê temenê de wê çerçoveya wan a olî ku wê çendî wê ne fermî jî bê lê wê di wê temenê de wê di nava baweriyê de wê yekkirinekê wê bidina çêkirin û ev wê weke ku wê bandûra wê ji nava ragihandinên aligirên manî wê li wê rewşê wê bibê. Ji aliyê din ê duyem ve jî wê di wê temenê de wê, piştî wê heta dema mezdek ku wê, ew politikayên hişk ên olî wê werina meşandin û wê bina temenê şerên bi mezdekiyan di demên piştê jî wê li gorî ku wê were dîtin wê temenê wan di dema şapûrê duyem û politikayên wî yên dema wî ên olî û hwd de wê were avêtin.

Di aslê xwe de wê biqasî ku wê were dîtin wê dema şapûrê duyem wê weke demek ku wê sasanî wê derkeve li astek bilind piştî mirina şapûrê duyem û birayê wî yê hewî ardişêrê duyem (379-383) û şapûrê sêyem (383-388) wê nikaribin wê qabilieya şapûrê duyem bidina nîşandin. Piştî wan wê di awayekê de wê, were dîtin ku wê wan herêmên qafqasan û ermeniya roja me wê di dema behramê çarem (388-399) wê, di rengekê de wê were dîtin ku wê, çendî ku wê ne zêde di wê qabilieyeta şapûrê duyem de jî bê lê wê, karibê wan herêmên qafqas û ermenia ji destê roma bistênê. Behramê çarem wê di awayekê de wê, sasanî wê, hinekî din wê bi tevger bikê. Lê kûrê wî yazdigirtê yekem ku wê li dora 399-421'ê de wê li ser taxtê wê rûnihê wê, di gelek şîroveyan li ser wî ên ku wê di roja me de wê, were kirin de jî wê, bê şibandin constantinê yekem ê roma demê a rojhilat û ankû wê weke ku wê di hin nivîsna de wê weke destpêka bizansê wê were dîtin. Wî zêdetirî wê dema şapûrê duyem ji xwe re minaq girt û wê di demê de wê, zêdetirî wê azadiyê wê bide baweriyê cihê. Di wê demê de wê maniyî jî ku wê di nava sînorê imparatoriyê de wê, misyoneriya xwe bikin wê ji wan re wê nebê asteng. Dema ku wê bahsa dema yazdigirtê yekem wê were kirin wê bi gotinên weke aramî, aşîfî û rehetiyê ku ew werênê welêt wê ji wî were bahskirin. Wekî din wê di wê temenê de wê di rengekê din de jî wê dikarê wê werênê ser ziman ku wê, di dema wî de wê, Theodosiusê duyem(408-450) wê were ser taxtê roma û wê, di wê demê de wê, peymanek aşîfîyê a mayînda wê bi roma re wê çêbikê. Li gorî hinek rêwayatna ku wê heta roja me wê di nava kurdan de wê di derbarê de wê were gotin ku ew bi keça cihuyekê re zewîcî û bi navê narsî wê kûrekê wî jî wê bibê. Wê

hinek dîrokzan wê dema ku wê bahsa wê keça cihû wê bikin wê bi gotina 'keçmîr' û ankû prensessekê wê ji wê were bahskirin. Heta salên li dora 438'an wê piştî wî kûrê wî yê ku wê weke bi navê 'behrâmê gûr' jî wê were bi navkiriin Behramê pîncem (421-438) wê, were ser taxt û wê li gorî hinek rêwayatna wê, arabên herêmê jî wê di dema wî de wê, piştgiriyê wê bidê û wê bi wan re di nava tîkiliyek xweş de wê, desthilatiya wî û dema wî bi rê ve wê herê. Ku wê were gotin wê dayika wî sosandukht wê, cihuyekê eksilayî bê. Di hinek rêwayatên ku wê li dora kirmaşanê wê were vegotin di derbarê de li herêma dînwarê ku wê di wê dema ku min ev di nivîsan de wê were ser ziman ku wê, ew keçik keça mîrekê kurd bê. Lê ev mîrê kurd ku ew vegotin rast bê ew li ser wê temenê dikarê weke cihû jî were pênasekirin. Di awayekê de ew, di nava kurdên demê de jî wê di awayekê de wê were hasibandin û wê bi wî re wê tevgerîn wê bibê wê, ev faktor jî wê bi awayekê mihtemelî wê karibê weke nişanaka wê jî di rengekê de bê dîyarkirin.

Di dema wî de wê, herêmên asya ên ji ermeniya wirdetir wî çav berda bû wan. Dixwest ku ew sînôrên sasani hata hindistanê bibê. Di awayekê de wê di kirinên wî de wê, were dîtin ku ew zêdetirî li gorî kevneşopîyên civakê tevbigirihê û ji wan re rêzê bide nişandin jî wê tevbigirihê. Di wê demê de wê, gelek pêjnên çandî û wêjeyî ên demên medan wê jinûve wê wan bibîrbênê û wê derxê li pêş. Ev wê li xoşa mir û asilzadeyên kurd wê werê. Di dema wî de wî kûrê xwe ku wê piştî wî weke yazdigirtê duyem jî wê were bi navkirin wê bi zêdeyî wê di warê tîkiliyên dîplomatîkî de wê, bide pêşxistin û di wan karan de wê, bicih bikê. Piştî wî ku wê kûrê wî wê were ser taxt wê bi çîn û hindistanê û hwd re jî wê tîkiliyên xort ên dîplomatîkî wê dênê. Wê di wê demê de wî sefer li hemberî romayên herêmê da destpêkirin û hema bêja heta nêzî navenda wan wê di awayekê de wê herê. Wê herêmê wê desthilatiya xwe ya dema sasaniya mazin wê weke ku wê nû ve wê saz bikê. Li gorî hinek dîrokzanan ku wê yazdigirtê duyem wê were şîrovekirin wê weke keseyekê bi qabiliyet wê were pênasekirin û wê ji jê wê were bahskirin. Lê wî di wê demê de wê weke ku wê were gotin ku ew hêza wî hebû ku ew heta navenda roma jî hêzên xwe bide birin û bidest bixê. Lê wî ew nekir. Wî piştî wê hêzên xwe li nişapûrê berhevkir û herêmên partian wê di wê demê de ku wê di bin hêrîşên keyaniya kidarite de bin wî hêzên xwe li hemberî wan kir seferê û ew heta ji çemê deryaya amû wê wan bide derbaskirin. Di wê demê de wê, were ser ziman ku wê di dema wî de wê, mesihiyên herêmî ku wê piştî roma rojhilat ku wê bê mesihî ku wê bi wê re wê bikevina tîkiliyê

wê serê wan wê ji taxt bide dûrkirin û wê, kesên aligirên xwe wê ji nava wan wê binaqênê û wê bide danîn ser taxt. Ev rewş wê, heta dema şerê wartanantzê ku wê kûrê wî Hûrmûzê sêyem (457-459) wê li ser taxtê wê rûnihê. Lê di wê demê de wê, şer û pevçûnên taxt wê di nava sasanîyan de wê bibê û wê di demê de ku wê Hûrmûzê sêyem (457-459) wê were ser taxt wê demên xwe wê bi Fîrozê yekem ku wê bi alikariya asilzadeyên herêmê wê bixwezê were ser taxt re wê derbas bibê. Fîrozê yekem di wê demê de ku wê hûnî û ankû mogolî wê hin bi hin wê derkevin û wê werina herêmê wê demên wî bi pêşilêgirtina wan re wê derbas bibê.

Di wê demê de wê hêrîşên hûnan li herêmê wê bibê. Behramê pêncem û yazdigirtê duyem wê tekçûnekê wê bi wan wê bide jîyankirin û wê pêşîya wan û hatina herêmê wê bide girtin. Lê di dema Fîrozê yekem de wê, ev wê li gelek deveran wê hêrîşên talanê û kevilkirinê wê bikin û wê, gelek ziyarên zîrarên mazin wê bidina herêmê.

Dema fîrozê yekem de wê li ser taxt wê gelek leyistok wê werina kirin. Di wê demê de wê, demek hem wê di nava sasanî de wê, leyistokên taxt wê xwe bidina dîyarkirin bê û hem jî wê ji derve wê, di awayekê de wê weke ku wê were dîtin wê, hêrîşên derve wê di awayekê de wê bibê. Li herêmê rûdana komên weke ên hûnan wê di wê demê de wê, hem herêmên roma û hem jî ên sasanî wê di awayekê de wê, bikê bin pêvajoyên talanê ên ji aliyên wan ve ku ew dihên kirin. Fîroz di wê demê de ew ketibû derdê taxt de. Wê çendî ku wê li nava sasanî wê, hinek seferên pêşilêgirtinê ê hûnan wê bikê lê wê zêde wê pêşde neçê. Di wê demê de wî weke ku wê were ser ziman wî birayê xwe Balaş ji taxt re amaede dikir. Piştî wê di nava salên 484-488'an de wê li ser taxt wê rûnihê. Lê di dema ku ew di demek pevçûnekê de wê, derbeyekê ji çavên xwe wê bixwê û wê kor bibê wê, piştî wî birayê kawadê yekem wê were ser taxt. Li gorî hinek ragihandinan jî wê were ser ziman ku wê, Talaş wê ji aliyê asilzadeyên sasanî ve wê bo ku ew ji taxt were kirin wê were korkirin.

Dema kawadê yekem wê, di awayekê de wê, taqabûlî dema mezdek û hatina wan wê bikê. Di wê demê de wê mezdek wê, wekhevîyekiyekê di nava gel de wê bixwezê û wê di wê temenê de wê hizrên mezdek ên li ser wê temenê ku ew bi temenekê li ser çorçoveya hizrên zerdeşt-manî re wê werênê ser ziman wê, bandûrê wê bikê. Mezdek wê di nava kurdên mezdekê ên herêmê de wê di demek kirin de wê li herêmên rojhilat heta xorasanê û gelek deverên din wê ji xwe re wê aligiran wê bibînê. Di

awayekê de wê, kawadê yekem wê, di awayekê de wê, ji asilzaedeyên dewlemend ên li dora xwe bixwezê ku ew semyanên xwe bi gelek ve parvebikin. Li ser wê temenê wê di renekê de wê, di aslê xwe de wê ev rewş wê, çendî ku wê ji aliyê gel û mezdekiyan ve wê bi xweşbînî wê were pêşwazîkirin lê ji aliyekê din ve jî wê ji aliyê çîna dewlemend a sasanî ku wê ji kurd, faris û hin komên din ên herêmê weke cihû û hwd wê biafirê ve wê bi başî newê pêşwazî kirin. Li ser wê temenê wê di renekê de wê, weke aliyekê wê yê ku mirov wê di dewama wê de wê, werênê ser ziman ku wê, li ser wê di renekê de wê, di nava wan de wê li lêgerîna hanîna kesekê din ê li ser tat wê hin bi hin wê weke aliyekê din ku wê li wê were lê hizirkirin wê xwe bide dîyarkirin. Hizrên mezdeki wê li ser temenekê wekhevîyê, başî, qancî û çerçoveyek civakî a ji hev re alikar bê. Di wê rengê de wê modelek civakî wê di wê temenê de wê li wê were lê hizirkirin. Ew di wê temenê de wê rast nebînî ku wê kesek wê ji serî ve wê kifşîkirinê li ser temenê jîyane girseyan ku ew bikê wê rast nebînî. Ber vê yekê wê, di wê demê de wê, li gorî hinek vegotinna wê, ew wê kawadê yekem wê ji taxt bikin û wê biavêjina zindanê. Lê li gorî ku wê were gotin wê piştî ku ew ji zindanê di ravê wê piştî wê, li ser xwesteka asilzadeyan wê hêzên xwe wê biajoyê bi ser mezdekiyan de. Wê dema ku wê bahsa 'raperîna mezdekiyan' wê were kirin wê di encama wê de wê, li rojhilatê kurdistanê wê di awayekê de wê rûbide.

Lê çîna serdest a sasanî wê di wê demê de wê, êdî wê nexwezê ku ew kawadê yekem li ser taxt bimênê. Wê di wê demê de wê, ew ji taxt wê were kirin û wê kesekê din ê bi navê Jamaspa (496-498) wê were ser taxt. Di aslê xwe de wê li gorî ku wê li ser dema Jamaspa wê were vegotin ew wê birayê kawadê yekem bê û wê, di wê demê de wê, li şûnê ku ew dihê taxt wê piştgirîya çîna serdest a sasanî wê bistênê.

Di wê dema ku wê Jamaspa wê were ser taxt wê, demek ku wê Kawadê yekem wê seferekê bi navenda keyenîya heftalîteyîyan re wê li hemberî romayîyan wê bikê de wê were ser taxt. Di wê dema ku ew weke idereten ew ser taxt bê wê di wê demê de wê, çîna serdest wê ji wî bixwezê ku ew mayînda li ser taxt bê. Lê ew di wê demê de wê weke kesekê ku ew bi bawerîya bi birayê kawadê yekem bê û wê dema ku ew wegerîya ji seferê wê di wê demê de wê ew wê, taxt wê dewrî wî bikê.

Di wê temenê de wê, ew jî wê weke kesekê bi bîaqil û nerm wê were pênasin û wê di wê temenê de wê cihêrengiyên herêmê li gorî ku wê were ser ziman wê bi başî wê nêzî wan bibê û wê tevli azadiya wan nebê.

Di wê temenê de wê ev wê, di rengê de wê ji jê wê were bahskirin. Kawadê yekem wê ji gotinan wê weke kesekê ku ew demek dirêj wê li ser taxt wê rûnihê û wê, dema wî ya duyem wê weke demeka piştî wê sefera wî ya li hemberî romayîyan ku wê weke demek nû a a duyem ya zêr a sasanî jî wê were bi navkirin bê.

Di wê demê de wê, demekê wê hêrîşên hûnan wê li romayîyan wê bibin. Lê wê piştî wê, li herêmên kurdistanê û ankû mesopotamya jêrîn û jorin wê bibin. Li gorî hinek ragihandinnan wê heta herênên ber amedê wê ev herîş wê di awayekê de wê bibin. Li ser wê temenê wê, di nava welat de wê bi alikariya mirgehên herêmê wê di wê demê de wê, kawadê yekem wê seferê wê bikê û wê heta ber keviya diclê û firatê wê ew wê seferê wê bikê. Di dewama wê de wê, di wê demê de wê peymanek aşîtyê wê çêbikê. Di wê demê de wê romayî jî ji wê xoşnût bûn ku wê belaya hûnan wê ji wan berê xwe bide bi herêmên sasanîyan ve. Wê di wê temenê de wê di rengê de wê weke aliyekê wê yê din bê ku mirov wê karibê wê di wê temenê de wê di wê rengê de wê, li wê bihizirê bê.

Lê di wê demê de wê, di awayekê de wê romayîyên li herêmê wê di aslê xwe de wê hema bêja wê hebûna wan wê kêmbibê. Wê herêmên weke yê ermeniya roja me û gelek deverên ên qafqasya wê di wê demê de wê, bidin serkêşîya sasani de bin. Lê wê piştî bijartina xiristiyanîyetê a roma rojhilat û piştî wê ya rojava wê, êdî ew jî wê di wê temenê de wê di nava aramiyê de wê bixwezînin ku ew bi mesihîyên herêmê re di wê temenê de bijînin. Wê ti hêrîş û seferan wê nekin.

Lê di wê demê de wê, sefera kawadê yekem a li hemberî hûnan bi alikariya mirgehên kurd ên herêmê wê di rengê de wê serkeve û wê hûnan wê di awayekê de wê ji herêmê wê bide derxistin. Di wê demê de wê, piştî kawadê yekem derketina li taxt kûrê wî Hûsrewê yekem (531-579) wê, were pênasin. Ku wê di nava kurdên demê de wê weke têgînek unwanî jî wê were dîtin wê bi navê 'anûşîrwan' jî wê were pênasin. Ev gotin wê ji aliyekê din ve jî wê were wateya 'gîyane nemiran' jî. Dema hûsrewê yekem wê di rengê de wê, weke ku wê weke demek ku wê bi başî wê bahsa wê were kirin wê weke demek ku wê zêde ji wê were axiftin bê. Wê di wê demê de wê, weke demek ku wê di warê rêveberîyê, desthilatî û hwd de jî wê gelek rewşên xwenûkirinê ku wê bide destpêkirin wê di wê demê de wê ji jê were bahskirin. Li gorî hinek şîroveyan jî wê ew wê weke di rêya bavê xwe de wê herê û wê di wê temenê de wê, xwenûkirinên ku wî dabûbûna destpêkirin ew wê wan bidomênê.

Weki din dema hûsrewê yekem wê, weke demek ku wê zêde li ser wê were axiftin bê. Di wê demê de wî, çav berda herêmên li dora anatolia, sûrîya roja me û deverên li dorê ku wê, komên romî wê karibin xwe bigihênina li wan. Di wê demê de wê, peymanê ku wê di nava sasanî û roma de wê weke ‘aşîtiya mayinda’ ku wê were bi navkiriin wê, ew dawiyê li wê werênê. Çendî ku wê komên roma wê bixwezînin ku ew bacê jî bidina hûsrewê yekem bo ku ew bi wan re nekeve şer de lê ew wê, herê nakê û seferê li wan herêman dide destpêbikirin û di wê demê de wê, dawiyê li hebûna wan wê werênê. Di wê demê de wê, imparatorê romî Justinianusê yekem (527 - 565) bê û wê, piştî wî, Justinusê duyem (565-578) ku wê were ser taxt wê, piştî wê, li herêmên qafqas û heta azarbecana roja me û ermeniya roja me wê çav berdê wan herêman. Di wê demê de wê, bixwezê ku ew xiristiyanîyên wan herêman bikê raperîne. Hinekî jî wê bi kuştina waliyê sasanî ê divinê wê weke ku ew bigihijê wê armancê û wê, piştî wê baca ku ew bide jî wê bibirrê. Ev rewş wê, piştî wê, di awayekê de wê, bê sedema seferek sasanî li wê herêman. Lê berî wê, xiristiyanîyên herêmanê û hwd wê, bixwezê ku ew afûyekê ji wan re derxê û ew wan di wê temenê de wan ji wê rewşê dûrbikê. Di wê de wê hûsrewê yekem wê di ya xwe de jî wê weke ku wê bi serkeve.

Ev herêmên weke heta azaerbecana roja me û ermeniya roja me wê di wê demê de wê, weke herêman ku wê çanda zerdeştî û hwd jî wê li wan wê bicih bê. Wê, di wê temenê de wê weke herêman ku wê, mirov karibê bahsa wan bikê bê. Lê di awayekê din de wê, dema ku wê, xiristiyanîyên herêmanê wê bi afûya sasanî wê, Justinusê duyem nikaribê ji wê sûdbigirê û piştî ketina herêmanê Daraa û hwd li destê sasanî û hwd de wê, di wê temenê de wê, Justinusê duyem mecbûr bimênê ku ew dûbare peyamana aşîtiyê bixwezê.

Lê di wê demê de wê sefera hûsrewê yekem wê pirr zêde wê li ser wê wre axiftin. Piştî wê, ew dixwezê ku ew herêmanê dûbare bikê bin dest û wê heta herêmên yemena roja me wê seferê wê li dar bixê. Wê bi şandina hêze li giravên adenê û hwd re wê di rengê de wê, ew wê bikê. Her çendî ku wê keyê demê ê yemenê med-karib wê bixwezê ku ew dawiyê li seferê werênê jî lê ew wê di wê demê de wê, bidomênê heta ku ew bigihijê armanca xwe. Sefer wê, heta li dora 575 wê bidomê û wê di wê demê de wê yemen ku ew hemû bidest xistin wê piştî wê kûrê med-karib wê ku wê bi navê saif bê wê bê weke key û wê were denezandin. Piştî wê key Saif wê yemenê wê weke wilayetek sasanî wê bi rêvebibê û wê, di

wê temenê de wê li gorî hinek gotinna wê, sasanî û ankû hûsrewê yekem wê, waliyekê jî li yemenê wê tayin bikê.

Serkeftina wê demê a sasanî wê demekê wê bidomê û wê di wê demê de wê rewşek nû wê weke pergalek wilayatan wê pêşkeve. Û ankû wê were pêşxistin ji aliyê sasanî ve. Di wê demê de wê, sasanî wê baçê ji wan berhev bikê. Ev rewş wê heta dema kûrê wî Hûrmûzî çarem (579 - 590) wê bidomê û ew jî wê rewşê wê di awayekê de wê bidomê. Lê ne gel û ne jî herêman wê ji politikayên sasanî ên demê wê êdî wê ne xoşnût bin. Lê hê di dema hûsrewê duyem de ku wê, weke serfermandarekê bê Behramê cobin wê, bikeve nava raparînê û wê, di awayekê de wê, rewşa sasanî wê demekê bikê tengezerîyê de. Di dema sasanî de wê du kevneşopîyên desthilatî ku wê li qasrê wê hertimî wê bi hev re wê, di nava şer de bin wê bibin. Yek wê, li ser aliyê behramiyan re bê. Ya din jî wê li ser aliyê din ê li hemberî wê ku wê heta hûsrewê duyem wê were bê. Di wê demê de wê, raperîna Behramê cûbin wê hinekê jî wê, weke ya aliyê pêşî bê piştî wê, raperînê wê behramê cûbin wê bi navê behramê şeşem wê li dora 590 û wan de wê li ser taxt wê rûnihê. Ev dem wê di awayekê de wê, weke demek nû jî wê bi xwe re wê di rengekê de wê, werênê bê. Di aslê xwe de wê piştî rewşa mezdek wê ev rewş wê, di wê temenê de wê, hê jî wê weke tipolojiya sasanîyan wê xira bibê û wê, di wê temenê de wê, çawa wê bê kirin wê hê jî wê ji gelek aliyan ve wê weke ku wê ne dîyar bê. Hizrên mezdekiyan ku wê çendî wê sasanî wê demek dirêj wê li hemberî wan şer jî bikê û wê gelek mezdekiyan wê qatil jîbikê lê wê bandûra wan li rengê sasanîya demê û pêşveçûnên wê bibê. Hinekî jî wê rewşa behramê şeşem û hwd wê karibê di wê temenê de wê, bi awayekê di çerçoveya wê rewşê de di rengekê de wê fahmbikê û wê werênê ser ziman. Ev rewş wê hê ji dema hûsrewê duyem ku wê tengezerîyên bi rewşa roma rojhilat re ku wê bi dema Herakleios (610-641) re wê xwe bide dîyarkirin re wê, bi awayekê wê, weke ku wê dawiyê li wê 15 sal şerê wê demê jî wê bi xwe re wê werênê. Di wê demê de wê, sasanî wê, komên hûnan wê, hêrîşên wan wê hin bi hin wê bibiin. Hazarî wê weke hinek komên ku wê hêrîşbikin wê bibin. Di wê temenê de wê sasanî wê di wê demê de wê di aslê xwe de wê, bi ber ketinê ve wê êdî wê weke ku wê di encama wan herîşan de wê herê.

Ev rewş wê, ji aliyê qafqasya ve wê artişa roma a rojhilat di bin serfermandariya Rhahzadh de wê heta ninowayê wê di pêvajoyên hêrîşê de wê xwe bide dîyarkirin. Ev wê li dora 627an de wê weke 'şerê ninowayê' jî wê were bi navkirin. Di wê demê de wê, romayî wê heta

deverên weke mebeta zerdeşt a tahtî suleyman û agirgehên gede û adubadagan û heta gayshawanê wê werina armancgirtin. Di wê demê de wê li gorî hinek rêwayatna wê ev herêm wê di awayekê de wê bidin hêrîşên komên roma de wê werina talankirin. Di wê demê de wê agahiya ku wê hûsrewê duyem wê di ancama sûîqastekê de wê were kuştin ku wê belav bibê wê piştî wê, demek aloz wê êdî wê xwe bide dîyarkirin. Di wê demê de wê, ji keça hûsrewê duyem û heta spahbod Şahrbaraz ku wê derkeve ser taxt û wê artişên sasaniyan wê ji wan re wê serfermandariyê wê bikin.

Li dora salên 632'an wê, yazdigirtê sêyem ku wê weke newiyê hûsrewê yekem jî bê wê derkeve ser taxt. Di wê demê de wê yazdigirt wê bixwezê ku ew keyeniyên herêmê cardin wê berhev bikê. Lê wê di wê demê de wê ew nikaribê wê bikê. Wekî din wê şerê nava wan û romaya rojhilat jî wê herdû aliyan wê ji kal bikê. Wê wan biwastênê. Di wê demê de wê hin bi hin wê piştî ku wê, islam wê êdî wê derkeve wê, herêmên arab wê xwe bi temen wê hin bi hin wê têkiliyên xwe wê ji wê bibirrin û wê, di encama wê de wê, êdî wê di rengekê de wê, rewşek nû wê bi xwe re wê biafirênin. Sasanî wê di wê demê de wê, di awayekê de wê piştî wê ne bi gelekî re wê, zêdetirî wê bi rewşa ketinê re wê rû bi rû wê bimênê. Di wê demê de wê, li dora 633'an û wan wê aertişên islamê ku wê di bin serkêşîya kesên weke halit b. Welid û hwd de wê werin wê tenê di wê salê de wê, li dora neh û ankû deh pevçûnên mazin wê bi hêzên sasaniyan ên demê re wê bikin.

Di wê demê de wê ev şer wê di dewama yên romaya rojhilat de wê, êdî wê dawiyê li serdestîya sasanî a li herêmê wê bi xwe re wê werênê bê. Diwê demê de wê, dema ku ew dibin wê, artişên Rûstem Farrokhzad jî wê herêmên dora tizponê wê dorpêçbikin. Ji xwe wê piştî wê ne bi gelekî re wê herêmê wê hemûyî wê dagirbikin û wê talan bikin. Ev rewş wê weke rewşa dawî lêhatina sasanî jî wê karibê were xwandin.

Yazdigirtê sêyem wê di awayekê de wê, dema ku ew were ser taxt wê têgînên mezdekiyê wê di awayekê de wê ji xwe re wê bikê referans. Li gorî hinek rêwayatna wê ew bixwe jî wê ji malbatek mecûdî a kurd ba. Li ser wê temenê wê, ew wê newê redkirin. Piştî dagirkirina navenda sasanî wê ew wê artişên xwe wê bi ber xorasanê û herêmên nava wê de wê bide birin û wê, di wê temenê de wê, xwe li wê herêmê wê bidegirtin.

Di aslê xwe de wê, rewşa piştî ên wê heta babak û bavê mislimê xorasanî ku wê weke pêvajoyekê wê xwe bide domandin wê di wê temenê de wê êdî wê di rengekê de wê, destpêka wê jî wê, di rengekê de

wê weke ku wê bide dîyarkirin. Sasanî wê di awayekê de wê, li ser temenê navenda axamanişan Khwarwaranê wê ava bikê. Wê di wê demê de wê, komên weke çîna navîn ên şaşrdar wê, hin bi hin wê weke kermendên koma navîn wê pêşkevin. Di awayekê de wê weke ku wê were dîtin wê ji aliyê bawermendên zerdeştî û serekê wan mobadan ve wê, di renekê de wê, bi bandûra wî re wê, were dîtin ku wê, çawa wê xwediyê rewşek kifşkirinê a di demê de bê. Kesên bi wan ve girêdayî ên weke çîna azad "Vastrioshansalar" wê di wê temenê de wê pêşkevin û ev jî wê di nava civakê de wê xwediyê hêzek dîyarker û kifşkar a demê bin. Weki din wê çînek serdest a rêveberî di nava civakê de wê bibin. Li qasrê wê asilzadeyên Merv, Abarşehr, Karmania, Sistan, Îberya û heta adibaneyî û hwd wê were dîtin ku wê xwediyê hêzêk civakî a dîyarker bin. Di wilayatên sînorê ên marzbanê de jî wê xwediyê erkên li pêş bin. Di awayekê de wê dema ku mirov wê li ser wê re bahsa sazûmana demê bikê wê karibê wê bibêjê ku wê li herêmê wê sazûmanek baş û pêşketî a civakî wê di wê temenê û rengê de wê weke ku wê were dîtin wê bibê.

Tabî dema ku mirov wê bahsa demê wê bikê wê mijare sasanî wê li herêmê wê di awayekê de wê heta demên dawîya qatbûna roma re wê di renekê de wê xwe bide dîyarkirin. Romaya rojava wê bi awayekê dewletî wê xwe di renekê de wê bi temen bikê û wê bide domandin. Lê li rojhilat wê rewş ne wusa bê. Wê di awayekê de wê li herêmê wê, rewşên weke yên sasanî, part, kawûşakanî û hwd wê, direnekê de wê li hemberî wê bisekin in. Wê roma wê di awayekê de wê, temenê ku ev li ser wê dijîn wê bixwezê ku ew li wan bijî û ev jî wê bi dîrok û kevneşopîya wê ya civakî re wê di renekê de wê weke ku wê ne bi derfet bê.

Di awayekê de wê dema ku mirov wê bixwezê rewşa ramiyarî û desthilatî a demê wê bixwênê wê ji hindistanê bi xanadana gupta re bê û li çînê bi demên cihê ên bi wê rengê ên xanadanî re wê bê dîtin. Lê di wê temenê de wê mijare rojhilatê kurdistanê bê û em nexwezin ku em derkevina dervî mijare xwe û em wan aliyên din bi pêşveçûnên herêmê re wan werênina ser ziman. Ew jî bi serê xwe dikarin werina kirin mijare hinek lêkolinên din ên di wê çerçoveyê de li ser herêmê.

Demên piştî sasaniyan û hatina dema buweyhiyan û mirgehên din ên herêmî

Di awayekê de wê were dîtin ku wê di wê demê de wê hin bi hin wê di demên sasanî û ên ku wê bikevin de wê hinbi hin wê arab hî wê werina

herêmê. Di wê temenê de wê biderketina islamê û hwd re wê di wê temenê de wê ev wê bibê. Wê ev rewş wê li giştîya herêmê wê rewşên ramyarî û hwd wê di regekê de wê, bide gûharandin.

Di demên sasanî de wê mijare çand, ziman û hwd ji aliyê têgînek civakî ve ku mirov wê hilde li dest wê, were dîtin ku wê zimanê avêstayê wê di wê temenê de wê di regekê de wê serwer bê û wê di wê çerçoveyê de wê bi wê pêşveçûnên demê wê bibin. Di wê temenê de wê, li ser wê temenê wê pêşketinên bi devok û zarawayên kurdî ên demê û piştî wê re wê li herêmê wê bibê. Weki din wê li ser farîsî jî wê dikarê wê bi heman rengê wê rengê wê bandûra wê ji temen ve wê kifşbikê û wê karibê wê werênê ser ziman bê.

Di wê demê de wê, di derbarê çand û felsefeyê de jî wê dikarê wê gotinekê wê bi wê re wê bibêjê. Wê di wê demê de wê were dîtin ku wê li herêmê wê pêşketin wê bibê. Minaq wê, di dema hûsrewê yekem de wê were dîtin ku wê berhemên platon, aristo û hwd wê werina wergerandin û şîrovekirin. Di wê temenê de wê di regekê de wê, pêşveçûnên bi wê rengê wê bibin. Wekî din wê xwandina rengên hizrên din ên asya dûr û hwd bê wê di wê temenê de wê bi wê rengê wê were dîtin ku wê were ser ziman.

Pergale hizirkirinê a avestayî wê pergalek astronomi û bi epistemolojîkî wê di regekê de wê li ser temenekê bi fahmkirina jîyanê bi aliyên wê yên zêhnî û ne zêhnî re ku wê fahmbikê wê di nava dualiteyekê de wê bixwezê ku ew wê werênê ser ziman. Ev jî wê di wê rengê de wê bi wê re wê were dîtin. Ji aliyê mireteya wê ve ku mirov wê li wê binerê wê di wê temenê de wê karibê wê, bi rehetî wê bibêjê ku wê çerçoveyek berfireh a bi pêşveçûnên hizrî ên di wê warê de wê bixwe re wê di regekê de wê biafirênê. Tevî avêsta jî wê gelek nivîsar û pirtûkxaneyên demê wê piştî hatina islamê û pê de wê werina tarûmarkirin û şawitandin. Di wê rengê de wê dema ku wê bahsa wê rengê wê were kirin wê, di mijare pêvajoyên şerên li herêma şehrezorê de wê, ji wê aliyê ve wê gelek kirpendinên ku wê di wê rengê de wê di nava gel de wê werina kirin wê li kurdistanê wê werina dîtin ku wê werina ser ziman. Ji nava kirpendinan wê hinek ji wan wê di wê rengê de bin ku wê çî wê di wê rengê de wê, weke bi nivîskî wê werê dîtin wê bi zimanekê dijber wê were mahkumkirin û wê piştî wê were şawitandin û tûnakirin. Avêsta bixwe jî wê, di awayekê de wê, bi hinek kesên ku ew vêşartina wê, heta demên piştî wê ji wê tûfanê wê xilas bibê. Lê hê jî wê gelek beşên wê windahi wê di wê temenê de wê bi

gelek kanonikên wê yên ku ew hatina tûnakirin re wê hertimî wê bahsa wan wê were kirin.

Di wê temenê de wê, di aslê xwe de wê, ev çerçova wê di wê rengê de wê hinek tiştan wê di derbarê çanda demên berê de wê di rengekê de wê weke ku wê mirov dikarê wê fahmbikê wê bi xwe re wê di rengekê de wê weke ku wê bide dîyarkirin. Ev jî wê di wê rengê de wê bi wê re wê karibê were lê hizirkirin û were hanîn li ser ziman. Di dewama wê de wê dikarê wê werênê ser ziman ku wê, di demên piştre wê gelek vegotinênbi devkî û rengên kevneşopîyên pîroz û hwd ku wê di nava civakê de wê werina jînkirin wê di rengekê de wê, reng wê bidina rengê hizirkirinên ku wê piştre wê bibin. Di awayekê de wê, vegotinên bi evîndarî li ser temenekê rûhanî ku wê bi navê keç û kûrekê wê werina kirin weke kerem û aslê, leylûmecnûn û hwd wê di wê temenê de wê, weke berhem û rengna hizirkirinê ên ku mirov wê karibê bahsa wan bikê û werênê ser ziman bê. Ev çand wê piştre bi rewşên weke yên 'mem û zîna' ahmedê xanî û hwd re wê xwe di rengekê de wê bide nîşandin. Ev xosletê pîrozkirina jinê ku wê di nava wan rengên vegotinê de wê weke xosletekê çanda wê herêmê a kurdistanî bê û wê, xwe di rengê hizirkirinên piştre jî wê di demên islamê de wê bide dîyarkirin û ev tenê wê, minaqên wê yên zêde wê li vê herêmê wê bi zêdeyî wê werina dîtin. Weki din ji wan deman mirov wê zêde rastî minaqên demên kevn wê de wê newê.

Di nava zerdeştîyê de wê weke nirxek pîroz wê hildana li dest a zayenda jinê wê, di wê temenê de wê weke temenekê çandî a ku wê di wê rengê de wê karibê li ser wê temenê û di wê çerçoveyê de wê bi kirpênê û wê werênê ser ziman bê.

Di awayekê din de wê dema ku em bahsa dema sasanîyan bikin wê di wê temenê de wê di wê demê de wê serwerîya wan wê heta demên islamê wê di awayekê de wê kêr zêde wê bidomê. Piştî wê demê wê ji xwe wê rojhilatê kurdistanê wê biqasî ku mirov wê kifşdikê wê bi xwe xwediyê rengê pêşketina xwe bê. Di dewama wê de wê dikarê wê werênê ser ziman ku wê, weke aliyekê wê yê din wê ew wê bi wê re wê were dîtin ku wê di wê demê de wê, kurd wê li rojhilat wê di demên piştre wê herêm bi herêm wê xwe bi rêxistinkirî bin. Di wê temenê de wê dema ku wê, piştî demên sasanîyan wê seferên islamistan ên li xorasanê wê bi zêdeyî wê di wê demê de wê rastî wê berxwedana wê rêxistiniya civakî û desthilatî a herêmê wê were.

Çendî ku wê kurd wê di wê demê de wê di awayekê de wê bi rêxistin jî bin. Lê wê di hinek awayan de wê, hin bi hin wê rewşên nû ên xirab jî wê derkevina li holê. Di nava desniyan, berî wan babak û bavê mislimê xorasanîyan û hwd wê di rengekê de wê were dîtin ku wê çawa wê bibê.

Di demên piştî sasanî de wê, di awayekê de wê li rojhilat wê mrigehên kurdistanî wê navên wan ên giring weke herêm û bajarên rojhilatê kurdistanê ên weke urmiyê, kirmaşanê, hemedênê, xorasanê, mihabadê, ilam, sînê, dinwerê û hwd wê çend ji wan deverên ku wê di wê temenê de wê mirov wê karibê navê wan di wê temenê de wan rêxbikê bê. Di wê temenê de wê, ev dever û çend deverên din ên ku me navê wan hanî ser ziman wê di temenekê wilayatî de wê were dîtin ku wê xwediyê hinek rewşên mirgehî ên kurdiistanî bin. Li dora sedsale 9' min de wê weke li dora 950 û wan de wê were dîtin ku wê navenda wan xûzistan bê û wê ji wir heta şehrezorê wê di qadaka berfireh de wê serdest û serwer bin wê hasanwahîdî wê hebin. Wekî din wê hinek çavkanî wê dema ku wê bahsa wan wê bikê wê, bê gotin ku wê, heta herêmên li dora urmiyê wê di awayekê de wê weke ku wê were dîtin wê, li wê serwer bin. Li dora sedsale 9' min de di wê dema ku ew dijîn de wê hin bi hin wê komên selçûqî wê werina herêmê û wê bi wan re wê bikevina şerên giran de.

Di awayekê de wê hasanîwîdî wê di awayekê de wê, berî wan aê kabile û ankû aşîrên kurd ên weke ayşanî û ankû îsanîya wê hebin û ev aşîra kurd a mazin wê biqasî ku wê were dîtin wê li dora dinwerê, hemedên, nahawendê wê bi cih bin. navê mîrên wan ên weke Ghanim û Windad ku wê weke newiyên ahmed wê werina bi navkirin wê, bibin. Lê li gorî hinek çavkanî wê bidina nîşandin ku wê, herêmên ku wê şaqê aysani ku wê li wê serwer bê wê bi demê re wê, raastî dagirkirinên abbasî ên demê wê were û wê di wê demê de wê, bikê bin sehêta wan de. Lê şaqê ku wê bi bavikê Windad ku wê weke kûrê deysemî jî wê were bi navkirin wê, ew wê, desthilatiyek buweyhi wê avabikin û wê di wê demê de wê li herêmê wê, serwe bibin. Di awayekê de wê çavkaniyên herêmê wê bidina nîşandin ku wê buweyhi wê ji aliyê şûnpêya xwe ve wê bigihijina hasanîwîdîyan. Di dema salên 979 û wan de wê mîrê hasanwîdîyan bi navê bedir ku wê weke bedirê kûrê hasanweyh jî wê were bi navkirin wê herêmên dorê heta ermeniya û azaerbeycana roja me wê bikê bin destê xwe. Wê li ser wê çerçoveyê wê desthilatiyek berfireh wê li herêmê wê weke ku wê were dîtin wê avabikê.

Li gorî hin çavkaniyana wê piştî bedir wê kûrê wî Zahir wê derkeve li pêş. Di wê demê de wê, derketina li pêş a buweyhiyan bi şahê kurd şems

el dewlê ku wê weke navê wî were wateya 'roja welêt' jî wê di wê demê de wê, demek nû wê li herêmê wê were dîtin ku ew wê bi xwe re wê bide destpêkirin. Li gorî ku wê were ser ziman wê kûrê şahê demê ê kurd fehrûl dewle ê kurd bê. Ew jî wê ji herêmên hemedemê û heta deverên dûr ên weke gurgan û teberistanê wê were gotin ku wê bandûra wê bi serwerî wê hebê û wê, Fehrûl dewle wê kûrê rûknul dewlê ê duyem bê. Ew wê di wê demê de wê wekeku wê were dîtin wê şems dewle wê ûnwana 'şahan şah' wê hilde. Ankû 'şahîşah' ku wê di kurdî de wê, weke 'şahê şahan' wê karibê were pênasekirin wê bi navê wî re wê were dîtin ku wê derkeve li pêş.

Di wê demê de wê, buweyhi wê demek teybet a zêr wê biqasî ku wê were ragihandin wê di wê demê de wê bijin. Ev jî wê di wê temenê de wê, weke demek nû a desthilatî li rojhilat wê weke ku wê bi xwe re wê di rengekê de wê weke ku wê biafirênê bê.

Li gorî ku wê di nava hinek çavkaniyan de wê were dîtin wê, piştî rûknul dewlê mir wê kûrê wê fehrul dewle wê derkeve ser taxt û wê di demê de wê hinek rewşên ku wî pêwîst ba ku wî rast bikira wê bûban. Di wê demê de wê navenda wî ya li Rey'ê wê hebûna wî herê bikê. Lê di wê demê de wê rewşa desthilatiya şah adud al-dewle ku wê di rewşek cihê de wê xwe bide dîyarkirin wê bixwezê ku ew wê diserî de wê di bin otoriteya xwe de wê werênê li ser rêzê. Adud al-dewle wê heta baxdadê wê di qadaka berfireh de wê desthilatiya wî serwer bê. Di wê demê de wê navbeynî di nava wî û birazîyî wî Îzz al-dewle de wê hebê û wê di wê demê de wê ew wê bi wê ve wê mijul bibê.

Li gorî wê di wê demê de wê, fahrul al-dewle ku ew bo ew rewşa xwe xort bikê Ziyarid re wê levkirinekê wê bikê û wê di wê demê de wê ji desthilatiya şamanîyên afganiî jî wê piştgirîyê wê hilde. Di wê demê de wî dixwest ku ew ji aliyê herêmên weke ûrşelimê û hwd ve rewşa xwe xort bikê û wê dikê jî. Ev wê bo fehru al-dewle wê rewşek xort wê biafirênê. Di wê demê de wê Adud al-dewle wê dixwest ku ew weke yê pêşî ew li herêmê wer nasîn. Ber vê yekê wê ji reşa derketina li pêş a fehru al-dewle wê di wê demê de wê weke ku wê were dîtin û ser ziman wê bitirsihê. Di wê demê de wê, ji fehru al-dewle wê weke ku wê were ser ziman wê bi zêdeyî wê bi aqil wê tevbigirihê. Wê, dema ku wê Adud al-dewle li hemberê wê weke ku wê bikeve nava pozisyonê wê, êdî wê ne zor bê ku wê, di ber keviya desthilatiya wî de ku ew jî wê weke mirgehek xort a 'mû'ayyad al-dewle wê ji aliyl Adud al-dewle ve wê were bi erkkirin ku ew di wê demê de ew bandûra feru al-dewle bişikênê. Lê ew

wê di wê demê de wê di ya xwe de wê bi sernekeve. Lê wê demek dirêj wê weke ku wê di temenekê ramyarî de wê li hemberî hev wê bixin. Piştî di salên 983'an de wê adud al-dewle û sale 984'an de wê mû'ayyad al-dewle wê bimirin wê ev wê ji fehru al-dewle re wê weke firsendekê bê ku ew li herêmê bi giştî ew bibê serwerê giştî. Di wê demê de wê, piştî mirina Mû'ayyad al-dewle wê wezirê wî sahib b. Abbad wê, li civînek ku wê li gorganê wê bide li darxistin wê xwe weke xelefê Fehru al-dewle wê bixwezê bide destnîşandin. Di wê demê de wê, fehru al-dewle wê, di seferek gerînê a li herêma xorasanê de bê û wê di wê demê de wê piştî wê rê bigirê û wê herê gûrganê. Di wê demê de wê, weke şahê şahan wê di wê demê de wê were pêşwazî kirin û wê li giştîya herêmê wê desthilatiya wî ya mazin wê êdî wê di bin destê wî de wê were avakirin (Nagel, **Tilman** (1990). "BUYIDS". In Yarshater, Ehsan (ed.). *Encyclopædia Iranica*, Volume IV/6: Burial II–Calendars II. London and New York: Routledge & Kegan Pau).

Derketina li pêş a fehru al-dewle wê, di wê demê de wê, li herêmê wê encamên girîng wê bi xwe re wê werênê. Sahib b. Abbad jî wê xwe weke wezirê wî ê demê wê bide dîyarkirin û ev rewş wê, di aslê xwe de wê, êdî wê bi tememî wê rewşê bide gûharandin. Bandûra wezir sahib wê hebê û wê, di wê demê de wî jî dixwest ku ew derkeve li pêş. Di wê demê de wê ya xwe de wê weke ku ew wê bigihijê armanca xwe. Di wê demê de ku wê, ji ber girêdana wan a bi adud al-dewle ve wê şahên xûristan û basra tac al-dewle û dîya al-dewle wê, di rewşek ne naskirinê a bîdengîyê de ku ew xwe bidina girtin jî wê piştî wê civînê û encamên wê ew jî wê weke şahê şahan wê, hebûna fehrul al-dewle wê herê bikin. Fehru al-dewle wê di wê demê de wê rojhilat û herêmên farisan ên iranê ên din û dora wan jî wê bikê bin destê xwe. Malbatê Fehru al-dewle wê derkeve li Xanima fehru al-dewle ku wê bi navê 'şêrîn' bê wê, di wê demê de wê weke şêx wê derkeve li pêş. Wê navê wê jî wê di wê demê de wê, were bihîstin. Lê di wê demê de wê, di nava samaniyên herêmê de wê, dema ku wê pîrsgirêk li ser temenê desthilat û herêkirinê wê derkevin wê ew jî wê di awayekê de wê sefera kontrolkirinê li dora xorasanê û heta herêmên afganê wê li wan wê bidest li darxisstinê wê bikê.

Di wê seferê de wê biqasî ku wê were ser ziman wê Sahib b. Abbad wê bi rêve bibê wê bi destê wî ew herêm wê di bin desthilatiya fehru al-dewle de wê bînd gihandin li hev û wê bînd kirin yek. Di wê demê de wê weke kşrê piçûk ku wê li hemedênê wê li ser mirgeha xwe bê şems al-dewle wê hin bi hin wê derkeve li pêş. Li gorî hinek çavkaniyan wê di wê

seferê de wê, şems al-dewle wê di awayekê de wê derkeve li pêş û wê li herêmê wê serweriya xwe ku ew mazin dikê wê êdî wê derkeve li pêş.

Ji dema fehru al- dewle û heta ya şems al-dewle wê were dîtî ku wê desthilatiya buweyhiyan wê weke ku wê kêmbibê. Lê wê bi demê re wê, bi derketina li pêş a şems al-dewle re wê, li ser herêmên ji ûrselîmê heta teberîstanê û gelek deverên din wê desthilatiya xwe wê di wê demê de wê, mazintir wê xort bikê. Di wê demê de wê, pêşketinên ku wê bibin wê di awayekê de wê di çerçoveya desthilatîyek herêmî a di rengê împaratorî de ku wê dîmenekê wê bi xwe re wê bidina dîyarkirin bin.

Di wê demê de wê, desthilatiya semsan al-dewlet ku wê di çerçoveya wê ya li herêmna farîs, umman, xûzîstan, kirman û çend deverên re wê bibê wê bibê û wê bi wê re wê otorîteya xwe wê bide herêkirin.

Li gorî ku mirov wê di nava tîkîliyên ramyarî de wê dibîne wê rewşa teybet ên komplîka wê xwe bi tîkîliya samaniyan û şahê gezneyîyan mihemedê kûrê sabûk tîgin wê li herêmên xorasanê wê were tayînkirin wê di wê rewşê de wê, weke rewşek ku wê fehru al-dewle jî wê bi zêdeyî wê alaquadar bikê bê. Di wê demê de wê, ev rewş wê weke rewşên ku wê bikê ku ew di helwesta xwe de wê, hinekê bihizirê û wê di awayekê de wê, zêde wê pêşde neçê jî wê di rengê de wê li herêmê wê bikê. Ber ku wî ne dixwest ku ew di nava desthilatiya wî de rewşek şer rûbide. Biqasî ku mirov wê fahmdîkê wî dixwest ku ew rêyên tîkîlîdanîne ew pisgirêkên xwe yê desthilatî di asta pêşî de bi ceribênê ku ew çareserbîkê (Bosworth, C. E. (1975). "Iran under the **Būyids**". In Frye, Richard N. (ed.). *The Cambridge History of Iran, Volume 4: From the Arab Invasion to the Saljuqs*. Cambridge: Cambridge University Press).

Li gorî rewşa ramyarî a demê wê di wê demê de wê, bi şems al-dewle û bedir b. Hasaniwid wê, derkevina li pêş û wê di wê demê de wê hebûna xwe bidina nîşandin. Minaq rewşên weke yê majd al-dewle bo ku ew were kirin wê di dema xwe de wê, çendî wê giringîyê wê bide pênasekirina wî ya ji aliyê şems al-dewle û bedir b. Hasaniwid ve. Ev rewş wê, weke rewşek ku wê bandûra wan jî wê di awayekê de wê bi xwe re wê bide dîyarkirin bê.

Li gorî ku wê li dora 1013'an de ku wê Bedir b. hasaniwid wê bimirê wê piştî wê şems al-dewle wê bixwezê ku ew li giştîya herêmî serwer bibê û derkeve li pêş. Ji xwe wê di wê demê de ku wê, weke 'roja welat' wê were bi navkirin wê êdî wê piştî wê demê re wê êdî wê weke ku wê were dîtî wê bibê. Piştî roj û demên zor êm girtî ku wê serbest were berdan majd al-dewle ku ew firsendê dibîne xwe li şems al-dewle wê

bikê û wê di wê demê de wê ew jî wê weke kesekê bi wî ve girêdayî wê piştî mirina bedir b. hasaniwid wê, êdî wê, li rey'ê wê herê serê desthilatîyê. Wê di wê demê de wê ew wê êdî wê li wê herêmê wê di demên piştre wê navê wî derkeve li pêş. Lê ev demên şems al-dewle wê zêde ne dom in. Heta li dora salên 1020an û hwd wê ew jî wê bi nexweşîya giran wê bikeve û wê demek dirêj wê di nava nivînan de wê bimênê. Li gorî hinek ragihandinan wê were ser ziman ku wê ew wê, bo ku ew wî baş bikê wê bakê ibnî sîna ku ew were qasra wî û wî baş bikê. Hinek çavkanî dibêjin ku wê ibni sîna wê herê û wê heta ku ew li wir bê wê karê wezirtîyê jî wê di wê demê de wê ji wî re wê bikê (Gutas, D. (1987). "AVICENNA ii. Biography". In Yarshater, Ehsan (ed.). Encyclopædia Iranica, Volume III/1: Ātaš–Awā'el al-Maqālāt. London and New York: Routledge & Kegan Paul). Şems al-dewle wê piştî wê bi salekê li dora 1021'ê de wê bimirê. Piştî wê li şûna wî kûrê wî Sama al-dewle wê her ser taxtê şahiye.

Dema bûweyhiyan û piştî wê

Dema ku mirov wê li demên bûweyhiyan wê binere di awayekê de wê, di rengekê de wê weke ku wê demek piştî dema sasanî wê li herêmê wê serwer bê. Di wê demê de wê, di awayekê de wê, dema ku em li wê dinerin wê hêzên kurdi û kurdistanî wê di wê demê de wê di awayekê de wê hin bi hin xwe bi rêxistin bikin li gorî demê wê ser wer bibin.

Destpêka bûweyhiyan wê bi têgînek efsanewî wê were hanî ser ziman. Bûwey wê navekê ji avêsta jî ku wê karibê wê bi kok wê were kirin bê. Li gorî wê vegotinê wê, bûwey û ankû bûya wê kûrê kesekê zerdeştî ê bi navê 'panah-xûsrew' bê. Li lehîcanê wê dijîn û wê, piştî ku ew weke masivanekê dijî û misilman dibê wê du kûrên wî bi navê Alî û hasan wê bibin. Wê ew wê temenê desthilatîya bûidê û ankû bûweyhî wê biavêjin.

Çendî rast a em wê nizanin lê li gori hinek gotinna ku wê di wê nûqtîyê de wê, were ser ziman wê bê gotin ku ev wê, weke şûnpêya bi tûxmî a behramê pîncemîn ê dema sasanî bê ku wê xwe piştre wê bide domandin jî bê wê were hanîn ser ziman.

Piştî wê ev herdû mazin bin wê piştî wê, weke ali b. Bûya anjî bûweyd û hasan bin bûya û ankû bûweyd herêmê wê pêşî wê rey'ê wê bidest bixin û wê piştî wê hin bi hin wê li herêmê wê desthilatîyek ku ew mazin dibê wê avabikin. Li dora 945'an wê birayî wî ahmed bin bûweyd wê di awayekê de ew heta başûrê kurdistanê û li ser wê re wê heta xwe bigihênê herêma baxdadê û wê bidest bixê û wê desthilatîya xwe wê

şînorê wê mazin bikin. Piştî wê navê "dewlê" wê weke 'dewletbûnê' bi navê wan wê bibê û wê dema ku wê baxdadê wê bi dest bixê wê, bi navê 'mu'izz al-dewle wê ûnwana wê dewletbûnê wê bidest bixê. Piştî wê, navê hasan jî wê di awayekê de wê di wê temenê de wê bi temenekê ûnwani wê bi gûharê û wê, bi gotina 'rûkn al- dewlê' ku wê were wateya temenê dewletbûnê' wê werênê ser ziman wê bi wê re wê were bi nav û ûnwankirin.

Bûweyhiyî wê di awayekê de wê gelek dagerên zerdeştî ku wê di demên sasanîyan de wê werina bikarhanîn wê werina li holê û wê bikarbênin. Ber vê yekê wê di wê temenê de wê ji hinek aliyan ve wê bi gotinên weke 'jinûve vêjandina sasanî' jî wê bo bûweyhiyan wê were gotin û ev gotin wê were bikarhanîn. Di dewama wê de wê navê 'şahîşah' wê di wê demê de wê bikarbênin û ev nav wê navekê bi ûnwani ê dema sasanîyan jî bê. Wê, di wê demê de wê were bikarhanîn û wê weke şahê sahan û ankû keyê keyan û hwd re wê were bi watekirin û wê were ser ziman. Di dema bûweyhiyan de wê bi zêdeyî wê imad al-dewle wê bi zêdeyê wê navê şahîşah wê bi zêdeyî wê ji wan re wê êdî wê were bikarhanîn û wê di wê temenê de wê, di awayekê de wê, derkevina li pêş. Piştî imad al-dewle wê şahên bûweyhiyan wê navê şahîşah wê bi zêdeyî wê di rengekê de ku wê weke mireteyek ji wan demên sasanî jî wê were dîtin wê bikarbênin. Li ser wê temenê wê, destpêka bûweyhiyan wê, ku wê weke keyê wan ê efsanawî jî wê were dîtin cemsîd wê, bê gihandin li wî. Li gorî hinek vegotina ku wê li persepolisê bermehiyên ku ew hena wê werina gotin ku ew 'ji dema axamanîşan mana' ku wê çendî ji demên berî wan jî wê di wê demê de wê ew wê hebin jî wê di wê temenê de wê, bûweyhi wê bi xwe gihandina wan re wê, werina dîtin. Wê, di wê temenê de wê, di awayekê de wê, girêdanak bi temenî û nirxî wê li ser wê re wê bixwezin ku ew bi xwe re wê bidina çêkirin.

Dema bûweyhiyan wê weke ku wê were dîtin wê di dema adûd al-dewle de wê derkeve li astek li jor a bilind. Wê pêşkeve. Heta ku wê, li deverên weke şîrazê avakirinên weke 'band-e amîr' wê bê gotin ku wî temenê wê avêtiya. Di dema wî de wê, şînorê bûweyhiyan wê ji xorasanê heta rojavayê kurdistanê û şamê li deverên ku wê weke şînorên sasanî jî wê werina dîtin wê pêşkeve. Di destpêka wan ku wê weke bi zeyd wê têngîna şîitîyê wê bi wê bijîn jî lê wê piştî wê bi xwandinandina wê re wê di dewama wê de wê weke gihiştina têngîna '12 imaman' re wê, ew wê, pêşkeve. Di destpêka islamê de wê, bi têngînek xweşbînî wê təkiliya wan bi abasiyan re wê bibê û wê di wê temenê de wê, təkiliyek baş wê di nava

